

Rêbernameya Kurt ji bo Parastina Bajaran



Çapa çaremîn (16.03.2022)

Bi pênûsa John Spencer

Derbarê Nivîskar de

John Spencer akademîsyen, nivîskar, pispor û şêwirmendek navdar a cîhanê ye ku bi taybetî li ser şerê çêkirî ye. Wî zêdetirî 25 salan di Artêşa Amerîkî de xizmet kir, di nav wan de du şandên serbazî li Iraqê, ku her du jî li ser şerkirina li hawîrdoreke niştecih bûn. Kesên ku bi vî nivîskarî re eleqedar dibin dikarin wî li ser Twitterê li ser navnîşana jêrîn bişopînin: @SpencerGuard

Naverok

Emirên Spencer yê Herdem (Ji bo parezvanên bajarî)	3
8 Rêbazên Êrîşkirina Bajarekî.....	5
6 hêmanên sereke yên parastinê	6
Agahiyên giştî.....	7
Parastin û Ewlehî.....	11
Berbest, berbest, berbest!	17
Êrîş, Êrîş, Êrîş!	28
Tank	41
Molotov Kokteyl (Molotof).....	45
Kemîn.....	47
Parastina Sivîlan	56
Dermankirina birîndaran	59
Danustandin bi girtiyên şer ên dijmin re	75
Bombeyên neteqiyayî (UXO)	76
Îradeya Têkoşînê	77

Emirên Spencer yê Herdem (Ji bo parezvanên bajarî)

1- Parastin şewaza herî bihêz a şer e. Divê hêzên êrîşkar xwe bigihînin cihê we û divê hûn di noqteyên xwe yên amadekirî de bin. Divê ew ji kolanên vekirî derbas bibe da ku êrîşî we bike. Divê hûn dijminê êrîşkar li kolan û kuçeyan bikujin.

2- Tu car dev ji amadekirina parastina xwe bernedin. Heta di nava şer de be jî, divê hûn avakirina noqteyên xwe berdewam bikin.

3- Êrîşkar bibe cihê ku hûn dixwazin, ne li cihê ku ew dixwaze. Bi qasî ku hûn dikarin berbestan ava bikin. Hemû kolan, kuçe, derî û pencereyan bigrin. Bajar veguherînin keleha dîwaran a bênavber, da ku dijmin neçar bin ku tenê bi xefikên ku we berê amade kirine bikeve hundurê.

4- Çimento bikar bînin. Ew alavê we yê parastinê yê herî girîng e. Dar, dep û torbeyên qûmê bikar neynin, ew zeyf in. Çimento ku bi barên pola ve tê piştgirî kirin yek ji wan materyalên herî bihêz e. Ji vê materyalê berbest û pozisyonên şer ava bikin.

5- Tim xwe, pozîsyona xwe, û sîlehên xwe veşêrin. Dijmin tim dikarin we ji jor bibînin. Eger ew te bibînin, dikarin bi hawan, sarox, û bombe li we bixin.

6- Hemî cihan bin erdê bikar bînin. Eger cih wilo tine ne, yekser dest bi kolandina wan bikin. Dijmin ê berî êrîşê we bike, bombe we bike. Hûn dikarin tunelên bin erdê bikar bînin da ku xwe veşêrin, birevin, xwe biparêzin, kelûpel û erzaqên xwe embar bikin, tevbigerin û dijberî êrîşan bikin.

7- Hêmana surprîz hêmana herî girîng e, êrîşkar nikare ji çimento te bibîne. Hûn biryar didin ku şer dê kengî û li ku çêbibe. Dijmin ji sîukast/segvanan bajarî gelekî ditirse. Divê ew bifikire ku pişt her pencere segvan li benda wî be.

8 - Kom bi kom şer bikin. Şervanek têrê nake, komên ji 3-5 şervanan pêk tê ava bikin.

9- Her tim ji cihên parastî û veşartî êrîş bikin. Tu ferq nake ku tu tişteki diteqînî yan jî diavêje, ya girîng ew e ku tu her tim ji hundirê avahiyekê bilind an nizm, li pişt girên xirbeyan veşartî, an ji binê erdê derdiketî, tene avêtin.

10- Her tim plana revê hebe piştî êrîşa xwe. Divê hûn dîwar, erd û banan de qul bikin da ku dema bombeyên dijmin li ser cihê we dikevin, an jî dema ku ew ji te nêz dibin, hûn dikarin di navbera ode û avahiyan de tevbigerin. Gelek pozîsyonên êrîşên hevîrtî çêkin. Bila li pozîsyona xwe di bin avahî û xaniyan de mevziyan bikolin û ji bo revê wan bikar bînin. Van mevziyan bi cebîlxane, bombe, bisfîng, av, hwd. embar bikin.

11 - Tu car şaş nemînin. Dijmin ji şerê bajaran ditirse. Ew ê hewl bide ku bi pozîsyona we bi dizî derbas bibe. Tu carî ji 2/3 şervanên we zêdetir di xew de nemînin.

12. Avê vexwin. Eger hûn mina bimirin, nikarin şer bikin. Hûn dikarin tenê 3 rojan bê av, û 3 hefte jî bêyî xwarinê bijîn. Her çavkaniyeke avê sterilîze bikin (bikelînin, an kimyayên paqijî lê zêde bikin). Ji bîr neke vê gotine: rengê mîzê şefaf e, pirsgirek tine ye. Zer an qehweyî be, rewşa xeterî be.

13. Berî xwarinê destê xwe bişon. Nexweşî ji guleyên dijmin bêtir we bikujin. Dema ku hûn dixwin an vedixwin divê hûn 200 metre dûrî tuwaletê bin û tu car nehêlin ku mêş bikeve xwarina we.

14 - Divê hûn li gor qanûnên şer bimeşin. Divê hûn nîşanên taybet li xwe bikin da ku we wekî şervanek nas bikin. Taktîkên dijmin çî û çawa bin, di danûstandina bi hêzên dijmin ên girtî de divê hûn tim qanûnên şer bimeşînin.

8 Rêbazên Êrîşkirina Bajarekî

Rêgez hene ku rê li ber artêşê ku êrîşî bajarekî bikin digirin. Parezvanekê jîr pilan dike ku her yek ji wan bingeheên hêzên êrîşkar zêde bike û bikar bîne. Komek rêzik ev in:

1. **Fêde tim li cem parêzvanên bajaran e.** Êrîşkirin û têkbirina dijminek ku di cihên xwe yên parastine de ji êrîşkirin û têkbirinadijminek ku li cihên vekirî dimînin zehmettir e.
2. **Erdnigarî/jografiya bajaran fêde êrîşkaran di warê istixbarat, çavderî, keşif, hêza hewayê, û şiyana xwe ku ji dûr ve êrîş bike, kêr dike.**
3. **Parêzvan dikarin tim êrîşkar bibîne û midaxele bike, ji ber ku êrîşkar nikare wek parêzvan bi hêsanî xwe veşere.** Fêdeye taktikî yê herî girîng yê parêzvanan, ku ew dikarin di nav û di bin avahiyan de veşartî bimînin.
4. **Her avahiyeke wek mevziyek xurtkirî bibînin.** Bajar têjî bi avahiyan ku ji bo şer tê bikar anîn in. Avahiyên hikumetê/dewletê, ofîsan, û avahiyên sina'î bêtir ji çimentoyê qalind û pola tê çêkirin, û ji ber vê bi silehan nayê bandor kirin.
5. **Divê êrîşkar silehên teqemenî bikar bînin da ku bikarin derbasî avahiyan bibin.** 2 rêbazên heyî yên êrîşê noqteyêke bajarî hene: Yan ji binî hilweşîne, yan dîwarên wan biteqîne, hezên piyade bişîne, û avahî tam paqij bike.
6. **Bi awayê giştî, parêzvan bi hêsanî di bajarê de tev bigere.** Ew dikarin erdnigarî/jografiya bajar biguherin da ku harîketa xwe hêsantir bikin li çî cih ku şer hebe. Ew dikarin noqteyên xwe yên şer di nav û di bin avahîyan de pêkve girê bidin. Dikarin berbestan çêkin da ku kêmin li hemberî êrîşkarên nezanî bikin, ji ber ku di gelek cihên bajaran de rê ku êrîşkar nêzîk bibe kêr in.
7. **Cihên bin erdê sitarê parêzvanan in.** Parêzvan dikarin tunelên heyî bi kar bînin, an nû bikolînin, da ku noqteyên xwe yên şer pêkve girê bidin, xwe ji çav û balafirên dijminan veşerin, an jî dikarin wan bi awayî êrîşkar weke bombe bi kar bînin li hemberî hezên eskerî yên rawestandî.
8. **Ne êrîşkar û ne parêzvan jî dikarin hêzên xwe li hember hev kom bikin.** Noqteyên parastinê li erdnigariya bajarî tevgerên bi lez û bi kar anîna esker li hemberî noqteyên girîng asteng dikin.

6 hêmanên sereke yên parastinê

Van hêmanan giredayî hemû parastinan in, ferq nake cih çiqas mezin e an şeweye wî çawa ye. Di parastina bajarekî de, divê parêzvan tim li erdnigarî li dora xwe bifikire, û çawa dikare wî biguhere û bi kar bîne da ku rê bide şervanên berevan tiştê ku ew dixwazin bikin, di heman demê de nehêlin hêzên dijmin tiştên ku dixwazin bikin, bikin. Hêmanên sereke ev in:

- **Amadekarî:** Di eynî kêlîyekî ku parêzvanê bajarî dibîne ku şer pêşiya xwe de ye, divê dest bi pîlanê xwe bike û dest bi guhertina erdnigarî li dora xwe bike. Parêzvanê bajaran tu car dev ji amadekarî bernede. Heta ew di nav şer de jî, hinek şervan dikare hemberî dijminan şer bikin û di heman demê de hineke din dikarin berbest û noqteyên xwe ava bikin, hwd.
- **Nermbûn** – Divê ku parastina we ya giştî bi nermahî bê guhertin da ku li gorî kiryarên êrîşkaran bersiva xwe bidin. Ev ji bo tevahiya parastina bajarekî li ser hemû asteyan heya taxek tenê, girîng e.
- **Ewlehî** - Divê parêzvan her çar aliyên bajar biparêzin. Divê hemû noqteyên parastinê ji yek kesî zêdetir pêk tînin.
- **Operasyon bi kurayî** - Divê hûn dijmin ji mesafetên herî dûr bikûjin, û bi şeweyekî çember li dora navenda bajêr derkevin.
- **Sabotaj** - Bajêr bikar bînin da ku tabûrên êrîşkar û konvoyên êrîşkar ji hev biqetînin, û tankan ji eskerên piyade veqetînin.
- **Tevger** - Hem agir û hem jî parêzvanên bilez bikar bînin
- **Girse û kombûn** - Amade bin ku di demên girîng de komên mezin ên şervanên parastinê li dijî êrîşkaran zêde bikin.


Agahiyên giştî

Pêdivîyan kom bikin

Şerê bajaran, ji bo parastinê jî, çar qat ji heman operasyonê li gundan cebilxane bixwaze.

Ji bilî fuzeyên rêberî yê antî-tank (ATGM) yê mîna Javelins û NLAW, ji parêzvanan re gelek fişek, bombe, mayînên antî-tank, mînên antî-piyade, dronên xweteqer, hawan û fuzeyên hawanê, av, xwarinên ku xera nabin, û sotemenî (ji bo xwarinçêkirin, erebeyan, û jenerator) pewîst bin.

Parêzvanek çî hewce dike?



Yên herî girîng

1. Cebilxane (gelek)
2. Bombe (gelek)
3. Av
4. Xwarinên hazir
5. Silehên antî-tank (wek Javelin)

Yên girîng

1. Silehên antî-balafir (wek Stinger)
2. Mayîn (claymore)
3. Silehên segvan (Karnas, Zagros, Şîyar û hwd.)
4. Sileh (qeleş)
5. Mayînên antî-tank
6. Sotemenî
7. Dronan

Hejmar û fêde bi we re ne


Di sala 2016'an de, 100,000 leşkerên hêzên ewlehiyê 9 meh şer kirin da ku bajarê Mûsilê ji 5,000 - 10,000 DAIŞan bistînin. Di Şerê Cîhanê Duyemîn de, Almanan bi dehhezaran leşker bi kar anîn da ku bajarê Stalîngradê bi dest bixin, û ew bi ser neketin.

Rêgezên leşkerî dibêjin ku êrîşkar 3 heta 5 carî bêtir esker ku di dema êrîşek li daristanan an cihên vekirî de bixwaze. Dijmin mecbûr e ku 5 an bêtir leşkerên xwe ji bo her leşkerek / şervanek parastinê bişîne.

Çend parêzvanên amade dikarin li hemberî gelek êrîşvanan berxwedanekî mezin bikin.

Parêzvanê bajarî her tişt bi kar tîne

Parêzvanê bajarî hawîrdora bajar fem dike û nas dike. Bajar ya wan e. Çavkaniya hêza wan, erdnigariya bajêr e. Ew her pîvanek li gor berjewendiya xwe bi kar tînin: kolanên teng, avahiyên bilind, çimento, cihên bilind, qatên bin erdê, tunelan, û bi mîlyonan cihên veşartî ku ew dikarin jêr êrîşê dijminan bikin.



Introduction Figure-1. Multidimensional urban environment

Parastin û Ewlehî

Eger hûn ê şehîd bikevin, hûn nikaribin şer bikin. Erdnigariya bajarê çêkin da ku hûn herî zêde xwe biparêzin da ku hûn bikaribin li hemberî dijmin şer bikin.

Qonaxa yekem a êrîşa dijminan

Qonaxa yekem a êrîşa dijminan a li ser bajarekî, bombebaranana her noqteyekî yê parêzvanan ên naskirî be (avahî/cihên ku ji ezman ve tê dîtin an jî berê hatine zanîn) da ku parastina bajêr bixê û hêza parastinê yê bajêr bê moral bike. Di vê qonaxê de, divê hûn noqteyên girîng û noqteyên parastinê veşerin. Divê parêzvan zanibin çawa xwe ji bombebaranana xelas bikin (li cih wek avahiyên xurt û bin erdê) û li ku derê derkevin da ku dîsa şerê dijminan bikin: ev gelekî girîng e.



Qonaxa duyem a êrîşê dijminan

Di qonaxa duyemîn de, her ku êrîşkar nêzîkê bajêr bibe, ew ê dest bi bombebarankirina hemû avahîyên bajarî bike, bi hêviya ku parêzvanan teslîm bibin. Vê qonaxê dikare çend roj an çend hefte berdewam bike. Di vê qonaxê de, cihên bin erdê ji bo berxwedan û komkirina pêdivîyan û silehen we gelekî girîng e. Her ku dijmin nêzîkî bajêra bike, divê haya parêzvanan li cihên wan hebin.



Qonaxa sêyem a êrîşê dijminan


Qonaxa sêyem a êrîşa bajêr dê gulebaranê hem nerasterast hem rasterast be, di dema ku artêşa dijmina ber bi xetên sînor ên bajêr ve diçin û hewl didin ku têkeve nav bajêr. Ev demeke bi xeter e ji ber ku divê parêzvanan karibin êrîşê dagirkeran bikin, lê di heman demê de ji êrîşên wan xwe xilas bikin. Parêzvanan dikarin "hembêza" dijminan bikin; tê wateya ku dijmin nêzîk bibe heta ew ji tirsê kuştina leşkerên xwe nema dikarin hawan û topên xwe bi kar bînin.

Hûn dikarin noqte û çeperên xurt ji mahiyên avahiyê yê qonaxên berî ava bikin.



Tim xwe veşerin!


Divê hûn tim veşartî bimînin. Eger dijmin we dibîne, dikare bi sarox, fuze, bombe, hawan, katyuşa, û hwd. êrîşê we bike. Perde, batanî, lihêf, laylûn, dêp, alûmînyûm, plastîk, an tişktekî din li ser an di navbera avahîyan de deynin da ku dijmin nikare ji jor an ji kolanan we bibîne. Her tiştî veşêrin.



Di bin erdê de bikar bînin!

Di dirokê de, cihên di bin erdê de wekî amûrek şerê bajarî yê bihêz hatin bi kar anîn. Cihên wisa dihelin ku parêzvanan ji bombeyan xwe xilas bikin, xwe veşerin, pêdvîyan kom bikin û biparêzin, bi dizî bigerin, û êrîşê dijminê dagirker bikin.

Cihên bin erdê, hevalên herî dirust ên parêzvanan in.




Eger li binê we cihê bin erdê tune be, dest bi kolandinê bikin. Tîmek ku ji çend sîvîlan pêk tê dikare tunelekî gelekî dirêj û kûr bi çend rojan tenê bikole. Sitargehên bombeyan, tunnel di bin avahiyên de, û cihên ewledar ji bo embara erzaqan bikolin.



Berbest, berbest, berbest!

Divê erdnigariya bajar bê guhertin ji bo ku hêzên leşkerî yên dagirker hêdî bikin an jî rawestînin, da ku hûn êrîşê wan bikin; wan dixin xefik û kemînan, nehêlin ku ew derbasî qada bajêr bibin.

Gelek xetên parastinê ava bikin. Li derdora bajêr çemeberên parastinê amade bikin. Berbestan ava bikin. Berbest û asteng deynin. Li her kolanê berbestan deynin. Lezbûn ewlekarî ye. Lêdan û îmhakirina wesayîtek an leşkerek ku hêdîka dimeşe hêsantir e!



- 30 deqe ji navendê re
- Bi lez ber bi armancê ve
- Gelek berbestan
- Sotemeniyê zêdetir dixwe
- Hêdî = armanckirin hêsantir e
- Xeta parastinê
- Berî her xaçerê



Çawa berbestan ava bikin (ku erebe dikare derbas bibe)



Tim parastina xwe xurt bikin!

Di her parastina bajarê de, divê hûn her tim ji bo êrîşa dijminan xwe amade bikin.

Tev dema ku hûn şer dikin, avakirina noqteyên xwe berdewam bikin. Hin parêzvanan dikarin şer bikin di dema ku hineke din noqte ava bikin. Tu car vala vala rûnenîn, û tu car li derve nesekinin! Mevzî nezikî noqteyên kontrolê ava bikin. Tunêlan bikolin!



Mevziyan, çal, sitargeh, û tunelan

Hemû rê ku têkevin bajêr asteng bikin!


Derkevin û li kolanan berbestan çêbikin! Bi hemû pir ku nehatine hilweşandin dest pê bikin. Bi otobus, foks, kamyonên çop/zibalê, erebe, çimento, dep/dar, çop/zibal bi xwe, hwd. asteng bikin. Dûv re her deverek li bajar ku avahiyên bilind li her alî hene, an cihên teng, asteng bikin. Hemû kuçe û kolan li ber dijmin bigrin!



Materyalên herî xurt bikar bînin!

Divê hûn bajêr bikin keleh û deriyên bigirin. Her kolan, kuçe, peyarêk, derî, û pencereya qata yekem asteng bikin. Materyalên bajarî bikar bînin, ew herî bihêz e û herî zêde parastinê dide.

Çimento û materyalên avahiyê, parastina we ye herî bihêz in.



Çimento yê bi hêz bikar bînin!

Çimento wekî materyalê parastinê ya bingehîn bikar bînin. Parêzvanê dikare çimento li gor berjewendiya xwe bikar bîne. Çimento ku bi qalikên pola (rîbar) hatiye çekirin, bi deh caran ji torbeyên qûmê çêtir e. Kevir, kelpîç, texle, û mahiyên avahiyê bi kar bînin.



Çimento bi pola



Torbeyên qûmê

Berbestên ku her tiştî rawestîne çêbikin!

Berbestên heyî bikar bînin. Li bajarên nûjen bi piranî ji bo noqteyên kontrolê yê erebeyan an parastina avahîyan berbestên wisa hene. Van berbestan wek kelehên amade tê bikar anîn. Jojîyên pola (berbestên sêgoşê ku tankan rawestînin) jî baş in.




Berbestên sêgoşê (jojî)



Têlê tûj bikar bînin!

Eger têlê tûj hene, wê bikar bînin. Sê heb li ser hev di navbera avahiyên de deynin. Têlê tûj yê sê-bendî dikare gelek wesatîyan rawestîne, û dikare lezbûna tankan jî kêm bike.



Çavkaniya wêneyan:

Jorîn: 18charlie - <https://bit.ly/36ENf>

Jêrîn: bit.ly/3LgnyMd


Xirbeyan bikar bînin!

Avahiyan hilweşînin: bi hilweşandina avahiyan, xirbeyan biafirînin û çimento, pola, kevir, tuxle, û tiştên din jê derxînin.



Kend û xendeqên antî-tank bikin!

Eger dem û alavên kolandinê hebin, xendekên antî-tank bikin û li dora deverên herî qeşbalix ên bajêr, bi taybet deriyên ku bînin parastin bîyî ku bandorê li pêwîstîyan sivîlan bikin, bikin asteng. Armanc ew e ku li qadên bajarî yê jixwe qeşbalix in, zêde bikin.




Çavkaniya wêne:

<https://www.globalsecurity.org/military/library/policy/army/fm/5-102/Ch6.htm#s3>

Hemû wesatîyan rawestînin an hêdî bikin!

Hemû wesayîtan ku têkevin an derbas bibin deverên we hêdî bikin an rawestînin. Hemû kolanan asteng bikin. Wan hêdî bikin da ku hûn dikarin fişek an molotovan bavêjin wan. Divê hûn di hundirê avahîyan bimînin, ji ber ku parêzvan ku derkevin kolanan gelekî xuya ne û dijmin dikare wan bi fuze yan sarox bixin.




Li hemu bajaran berbest çêkin:

- Lezbûna dijmin kêr dibe
- Wesayîtên dijmin bêtir sotemeniyê dixwin
- Dikarin hêsantir hedef li dijminê bigrin

Berbestên bi zîkzak ava bikin!

Eger kolanek hebe ku hûn hîn mercbûr in bikar bînin, berbestên bi şeweye tîpa "S" ku hîn jî wesayîtek hêdî dike ava bikin. Şewazê wî wek noqte kontrolê ya polîsan. Hûn jî dikarin wek benda kontrolê bi kar bînin eger hûn dixwazin sabotor/sixor bi vî awayî bigrin berî ku ew bigihin cihê we. Divê rêyên vekirî ku dihele wesayîtan bilez bajon tinebe.




Êrîş, Êrîş, Êrîş!

Dibe ku armanca parastina bajarî ne kuştina hemû êrişkarên dijminê be, lê êrişên bênavber û bijartî digihîjin armanca parastina bajêr. Divê her kolan bibe makîneya goşt ku dijmin leşkerên xwe yê êrişkar têxe hundir da ku bi destê we bê kuştin.

Di hundirê bajêr de noqteyên xurt ava bikin!

Li ser rêyên girîng yê têkevin bajêr de noqteyên xurt ava bikin. Divê rêya revandinê (wek kunek di dîwarê avahiya cîran de) hebe. Lê belê, karê paqijkirina noqteyên xurt û sereke dikare çend roj berdewam bike. Avahiyên bi cam û bi dar/dep bikar neynin, ji ber ku wana bi hêsani bêtîkandin an şewitandin.



1. Di dîwarê bin banê de kunekî biçûk
2. Nobetçî di serdavê de
3. Qulek li erdê
4. Qapax
5. Tora têt
6. Perde
7. Stûn

8. Pilaster rakir an qapaxa hişk peyda bikin
9. 2 tebeqên torbeyên qûmê li erdê
10. Derî
11. Tebeq (da ku dijminan dereng bixe)
12. Qûm
13. Text bi bizmar li ber şebeke
14. Sindoqên bi keviran dagirtî
15. Erdê
16. Nebat rakirin

17. Text bi bizmaran (Rêza teng ji bo parêzvanan derbas bibin)
18. Av
19. Cebilxane
20. Sindoq bi keviran dagirtî
21. Deriyê ku ber bi derketina acil ve diçe
22. Têlê tûj ku li goşeyan stûr dibin
23. Serşokê têtî bi av
24. Boriya ava baranê rakirin
25. Dîwara qulkirî

Amadekirina Xaniyek ji bo Parastinê

Karê we ê avakirina parastinê bi dawî nabe. Dem bi têne we sînor dike. Piştî ku tu cîhê gulebaran diyar bike û qul li wan dîwaran çêkin, divê hûn karê xwe li gor wextê xwe birêxistin bikin.

Qulên bombeyan

Divê qulên biçûk di qatan de bân birîn, da ku eger dijmin bikeve qata xwarê hûn dikarin bombeyan bavêjin ser wan.

Ger bixêrîyek hebe, bi têlên tûj tijî bikin


Çavderî

Qulek ji bo çavdêriyê di dîwara serdavê di bin banê de çêke.

Pencereyan bi perde an torbe qapat bikin. Pencereyan bi tora têl veşêrin da ku bombeyan bisekinin.

Du tebeqan torbeyên qûmê li erdê nehêlin ku fişekên dijmin ku ji xwarê tên avêtin derbas bibin

Wek derenceyên demkî, pêstirk an benê bi girêkan bi kar bînin



Parastina pencereyê û 'tabût'

Tora têl a li ser pencereyan bombeya dijminan rawestîne. Lêbelê, eger hûn 'tabûtek' bi torbeyên qûmê li dora cihê xwe ê gulebaranê ava bikin, hûn xwe ji teqîna bombeyan û hilweşîna banê biparêzin. Dûv re, eger dijmin bikeve odeya we, hûn dikarin bombeyek li ser tabûta xwe bavêjin hundurê odeyê.


Dema ku hemî amadekariyên din qediyên, derenceyan hilweşînin an jî texte ku bizmaran li ser wan bixin.

Şer di tariye de

Ode di tevahî an nîv-tariyê de bin, ji ber vê yekê hûn dikarin têl di hundurê de bikar bînin da ku êrîşkar hêdî bike û bihêle ku hûn birevin.

Dîwaran qul bikin

Dîwar gelek qul bikin û tunelan çêkin. Taktîka ku bi navê "çalên mişkan" tê zanîn - qulên ku di dîwarên hundir û derveyî avahiyên de tê çêkirin ku bihêlin leşkeran di nav dîwarên derve û cîhên hundir ên avahiyên de bigerin - yek ji teknîkên parastinê ya herî baş e. Ew dihêlê hûn di avahiyên çimentoyê de bi awayî veşartî û parastî tevbigerin û êriş bikin. Tunnel dihêlin ku hûn xwe jî ji bombeyan xelas bikin.



Mevzîyan hundir û derveyî avahiyan çêkin

Eger dem hebe, mevziyên girtî bi destê xwe çêkin. Divê ku kamuflajê li ser wî hebe û ji jor ve nayê dîtin.



Sihelên giran bixin hundirê avahiyan

Hûn dikarin sîlehên giran têxin hundirê avahîyan. Hûn dikarin sîlehên giran ji hev veqetînin û ji nû ve werin çêkin li qatên jorîn ên avahiyekî da ku hûn dijmin bêtir bibînin û kemîn li hemberî wan çêkin. Ev jî sîlehên we yê herî kujer diparêze.




Pêdivî (alavên veşartî) li her derê veşerin

Li her devera ku hûn ê şer bikin, pêdivîyên xwe deynin: noqteyên seretayî, duyemîn û sêyemîn. Erdnigariya bajarî têjî bi noqteyên yê veşartî û parastî ye. Cihên embara pêdivîyan jî dikarin xizmeta gelek noqteyên sereke, alternatîf, û hevpiştî bikin.



Ji avahiyên êrîş bikin (li kolanan nemîn)

Kolanên ku bi avahiyên nêzî rêyan in ji bo êrîşê bikar bînin. Qatên bilind hê çêtir in, ji ber ku tank û sîlehên din nikarin lûleyên xwe ewqas bilind bikin. Ji bo êrîşkaran êrîşî cihên ji wan bilindtir e, gelekî zehmet e. Divê parêzvan heta kêliya êrîşê di hundirê avahiyên de veşartî bimînin, û dûv re noqteyên xwe biguherînin.




Ji hundirê avahiyan gulebaran bikin

Ti sedem nîne ku parêzvanek bajarî dema ku di noqteyên xwe yê êrîşê de ye ji ezman an kolanê ji hêla êrîşkarê ku nêzîk dibe ve xuya bibe. Lûleyên sîlehên xwe ji pencereyan dernexin. Li paş bimînin û ji hundirê gulebaran bikin da ku dijmin we nebîne.

Artêşan ji segvanan ditirsin. Bila her pencereyê bikin noqteyekê segvanî yê gengaz. Ji nav ode û avahiyan de fîşek bavêjin derve.

Sîlehan ji pencereyan dernexin

Di hundirê de hûn nayên dîtin



Pilana êrîşên xwe bikin

Baş bifikirin hûn ê li ku derê gulebaran bikin, ji ber ku eger hûn şehîd bikevin, hûn nikaribin şer bikin. Cihên bilind li ser kolanên dîrej bijêrin. Bavêjin û bozdin. Kemînan çêkin. Hedef li pencere û derîyan wesayîtên ne bi zirxî û leşkerên piyade bigrin. Segvan xewnereşekî herî bi tirs yê eskeran.




Heremên şer ava bikin (Qadên Kuştinê)

Yek ji taktîkên parastinê yê herî bi hêz, avakirina qadên şer ye (qadên kuştinê, tê wateya ku cihên ku dijmin ê bimire).

7 gavên hêsan ji bo avakirina qadekê kuştinê:

- Hemû rêyên ku dijmin xwe bigihin we nas bikin.
- Tesbîta bike ku dijmin ê çî bike/hewl bide ku bike.
- Li ku derê hûn dixwazin dijmin bikujin diyar bikin.
- Berbestan pîlan bikin û deynin (da ku wan hêdî bikin/rawestînin).
- Biryarê bidin ku hûn ji ku derê xwe veşêrin û gulebaran bikin.
- Gulebaranên nerasterast pîlan bikin (wek molotof kokteylan).
- Planê xwe gelek caran pratîk bikin.



Dronên biçûk ji we re bibin alîkar

Li gor rewşa şerê elektronîkî/rewşa teşwîşî, dronên biçûk ên bazirganî werin bikar anîn da ku êrişkaran bibînin û nehêlin ku wan parêzvanan şaş bike. Dikarin tirsê jî bixin dilê leşkeran. Eger ew li jor binerin, û nizanibin ka çi li ezman heye, ew ê nizanibin ka ew drona kujer e an na.



Çavkaniya wêneyê:

<https://bit.ly/3IBen7o>

Êrîşên "lêxe-birev" (kemîn) bikar bînin

Kemînên "lêxe-birev" û antî-tank bikar bînin. Di Şerê Yekemîn ê Grozniyê de, komên biçûk ên ji 3-5 şervanan ku tenê bi qeleş, bombe, û çend bisfîng êrîşê wesayîten zirxî kir ji jêzemînan an ji qatên jorîn ên avahiyên. Tank û sîlehên din nekarî bi awayekî bi bandor bersiva xwe bidin. Şervanan li wesayîten li paş û pêş karwanê xistin, da ku yê din di nava xefika xwe de bihêlin, lêxistin û dûr ketin.





AFP

Tank

Êrîşkarê bajarekî di şerekî dijwar de divê tankên xwe hebin da ku biçin hundirê bajêr. Tank, eskerên piyade, endezyaran, topxane, û tiştên din ji wan re lazim in. Lê ew bi rastî tank ji wan re gelekî pewîst in. Divê parêzvan îmhakirina tankan wek yek ji erkên xwe yê herî girîng bibîne.

Tank nikarin sîlehên xwe gelekî hildin jor, û nikarin hedef li qatên jêrîn jî bigrin. Dema hûn êrîşê wan bikin, bila hûn li cihêkî ku ew nikare gulebarana we bike bin.




Çavkaniya wêneyê: Diagrams from US Army Army Tactics, Techniques, and Procedures 3-06.11

Combined Arms Operations in Urban Terrain

Serîyê tankê zeyf e

Cihê herî zeyf li her tankê jor e, li cih ku zirx (pola) herî zirav e. Ji ber vê yekê, ew ji Javelin û sîlehên din ên antî-tank ên ku çekên "jor-êrîşê" ne, ditirsin, ku berbi ezmên ve difirin û paşê bikeve xwarê li ser tankê. Eger sîlehên parêzvan wek bisfîng an tîfîng û bombeyên antî-tank nikarin zirxên qalind derbas bibin çêtir e ku ew li qatên jorîn ên avahiyan bin û wan ji jor bavêjin ser tankan.



Durêbînê tankan kor bikin

Dibe ku parêzvan nikaribin tankek hilweşînin, lê ew dikarin bikin ku ew nemeşe. Hûn dikarin tankê kor bike û bandorê li dîtina leşkerên li hundir bikin. Ev yek bi gulebarana li cihên dîtîna (cihên ku ew lê dinêrin - li jêr bi rengê sor hatine diyar kirin), bi taybetî bi çekên qalibê mezin weke bisfîng mimkun e.

Li destê çepê yê jorîn, pencereya dîtîna ya fermanदारê tankê ye. Li destê rastê yê jorîn îhtîmalek temaşekerê serbixwe yê barkerê ye (li gorî modela tankê ve girêdayî ye). Ew cihê pêşî, di bin sîlehê sereke de, pencereya ajokar e. Sîleh û tiştan li ser wan bavêjin ku van pencereyan bişkînin an qapat bikin.



Materyalên korkirina tankan ên din

Divê hewldanên xwe yê korkirina tankan ji cihê bilind tê kirin.

Hin şilek (ne av) ku li ser pencereyên dîtinê yê tankê tê avêtin ajotinê wî dijwar bike. Zeyta kevn an boyax, ku rahiştina wan zehmet in, bikar bînin. Eger leşkerek li hundir tankê deriyê xwe veke, dikare were gulebaran kirin.

Bi baldarî hilbijêrin ka kîjan wesayîtan li gor rewşê êrîş bikin. Kamyonek benzînê ya ku nikaribe xwe bigihîne cihê tankan ji kamyonek ku leşker hildigire zirartir e.



Molotov Kokteyl (Molotof)

Molotofan ku bi rêk û pêk bên bikaranîn, bibin sîlehên pir bi bandor. Wan ji deverên parastî, li hedefên rast, û li cihên bijartî yê li ser wesayîtan bavêjin.

Bifikirin ku hûn ê li ku derê bisekinin ku bavêjin (û dîv re birevin). Avêtina wan ji pencereyên li jorî wesayîtan taktîkê herî baş e.

Wesayîtên bê sîleh li jorê yê herî zeyf in, lê eger ew bi zirx e, hilbijêrin ku li ku derê lê bixin.

Cihên zeyf ên wesayîtan



Molotof û êrîşên din ên nêzî tankan

Molotofan bi piranî li hemberî tankên girtî bê bandor bin. Lê belê eger derîyên tankê vekirî ne, dibe ku molotof bi bandor bin, dibe ku molof tankek hêdî bike/raweste

da ku kemînek bi amûrên antî-tank ên çêtir piştgirî bike.

Du molotof ji yek têne çêtir e, bi taybet dema ku ji herdu aliyên kolanekê ji qatên jor bên avêtin.



Kemîn

Parêzvanê bajarî dikare kemînan ji bo piştgiriya qada xwe ya giştî an parastina xwe ya livok bikar bîne. Divê ew erdnigariya bajarî herî zêde bikin, lê di heman demê de dikarin kemînan li ser rê wekî rêyên di navbera deverên bajarî de çêkin.

Kemîn di taktîkeke leşkerî ya plankirî û pratîk de surprîziya herî mezin dike. Divê ku ew bi hişyarî tê pêk anîn.

Kemîn êrîşek surprîz e ku ji noqteyek veşartî li ser hedefek livok an sekinî ye.

Du şeweyên kemînan hene: **bi lez**, û **bi mebest**.



Sê cureyên kemîn hene:

Noqte. Di kemînek noqteyê de, parêzvan bi cih dibin da ku li qadayek kuştinê êrîşî dijmin bikin.

Herem. Li heremekî, parêzvan li du an bêtir têkildar belav dibin kemînen noqte.

Antî-zirxî. Kemînek antî-zirxî li ser wesayitên zirxî yên dijmin ku diherikin an demkî hatine sekinandin.

Du pêkhatinên hene: **xêzik** û **tîpa L-ê**.

Rêgezên kemînê

Ewlekarî - Divê parêzvanê bajêr her dem xwe biparêze. Di pêkanîna kemînê de ewlekarî û parastina komê xwe pir girîng e. Plan bikin ku koma kemînê biparêzin heta ku ew bigihîjin cihê kemînê, dema kemînê bikin, û dema birevin. Tîmek ewlehiyê her tim yekem kes e ku di kemînê de cih digire.

Surprîz - Divê kemîn ji dijmin re surprîz be, di wext û cih ku dijmin hêvî jê neke de be. Ji ber vê yekê kemînê pir plansaziyan, sizma/dizî û disiplîn dixwaze. Ger hûn surprîz winda bikin, her tişt winda dibe.

Tundiya çalakiyê - Kemînek serweriya sîle han û çalakiyekî êrîşkar hewce dike. Divê her du ji destpêka kemînê heta dawiya wî hebin.

Gulebarana hevpar - Divê kemîn qada kuştinê tecrîd dike da ku nehêle ku dijmin birevin an takfiye dijminê werin. Divê hemû sîleh, tev de mayînan, bîn bikaranîn. Komutanê kemînê ekît dike ku hemû sîleh di heman demê de têne bikar anîn da ku di saniyeyên destpêkê de herî zêde zîrarê bide dijmin.

Kontrol - Divê komutan kiryarên her komekê di kemînê de kontrol bike, di dema tevgerê de, dema li benda kemînê bin, û dema birevin jî. Kontrolkirina koma kemînê dema ku dijmin nêz dibe pir girîng e.

Rexistinkirina kemînê

- Komutan – Divê komutaneke kemînê û serokê her tîmekê hebe.
- Tîma Êrîşê - Tîma êrîşê di dema kemînê de sîleh biteqîne. Ew ê qada kemînê bigirin û ewle bikin. Ew ê parêzvanên ku dê biçin nav cihê kuştinê/kemînê biparêzin da ku tiştên taybetî bikin mîna sîlehên dijminan rakin.
- Tîma Piştgirîyê – Sîleh/şervanên ku rasterast îalîkar bidin wan şervanan ku kemînê dikin.
- Tîma Ewlekariyê - Şervanên ku berî ku şervanên din werin bicihkirin, dê pêşî li cihê xwe bi cih bin. Tîmê êrîşê diparêze, hişyarî zû dide, armancê kemînê tecrîd dike, piştgirî dide vekişandinê şervanan piştî kemînê.

Plankirina Kemînê

Piştî ku ji bo kemînê were rexistinkirin, divê parêzvanên bajarî ji bo kirina kemînê bifikirin û plansaziyê bikin. Rêgezek naskirî a komên leşkerî ku difikirin û plansaziyek kemînê bikin ev e: Armanc, Dijmin, Dem, Erd, û hêjmara şervanan.

Armanc - Divê hemû endamên koma kemînê bizanin êdî çi bikin, kar û erkên xwe çi bin, û çima ew kemînê bikin. Divê her parêzvanek fêhm bike.

Dijmin - Divê koma kemînê li dijmin bifikire. Tu carî êrîşî dijminekî nekin ku kom nikare bi sîleh ku di destên wan de ne bi ser bikeve. Li cure û mezinahiya hêza dijminê ku hûn ê êrîşî bikin an jî nekin bifikirin. Bifikirin ku dijmin dê di kemînê de çi bike. Takviye ji wan re were? Ma ew dikarin banga alîkariyê bikin? Çi sîleh û alavên wan dê hebin?

Dem - Divê koma kemînê bifikire ku ew ê çiqas dem bixwaze da ku bigihîje cîhê kemînê, dema amadekariyê, û ew ê çiqas li benda amadekariyê veşartî bimînin. Ew ê bi şev an roj bikin?

Cîh - Koma kemînê li ser cîhê herî baş ku kemînê bike bifikire. Çawa bigihîje wir? Meriv çawa erdnigariya bajar, rê, û berbest bikar bîne da ku dijmin şaş bibe û kemînê bike?

Hêjmara şervanan - Çend parêzvan hene ku dikarin kemînê bikin? Di her tîmekê de çend kes pêwîst bin?

Kemînê noqteyê

Cûreyeke bi bandor a kemînê noqteyê, kemînek bi mebest e ku pêş de tê plansaz kirin û li dijî armançek taybet li cîhek diyarkirî tê kirin.




Figure 7-4. Deliberate ambush

Kemînek noqteyê ew e ku parêzvan di yek êriş de bi yek qada kuştinê ve êrişî dijminê xwe dikin.

Ji bo komutana kemînê û tîmê xwe di plansazkirina kemînek bi mebest de, agahdariya berfireh pêwîst be. Tê de:

Hejmar û şeweyê hêza dijmin

Çek û alavên dijmin

Rê û cîhê tevgera dijmin

Cih û dema kemînê

Bijartina Cîh û Şeklê Kemînê (1)

Parêzvanê bajêr cîhê herî baş ji bo kemînê bijêre da ku karanîna surprîz zêde bike.

Xêzî. Di kemînekê bi şeklekî xêzî de, tîmên êrîş û piştgiriyê kêlêka rêya dijmin bi cih dibin. Ev herdû tîm li ser tewere dirêj a qada kuştinê bi cih dike û dijmin li ser milê we dike hedef. Vê şeklê dikare di cihên teng de ku tevgera dijmin li hember tîmê kemînê sînardar dike an jî li cihên vekirî were bikar anîn, û dijmin mecbûr e ku li qada kuştinê bimîne.

Bi şeklê tîpa L-ê. Di kemînek bi şeklê L-ê de, tîmê êrîşê alîyê dirêj ê kêlêka rêwîtiya dijmin a nav devera kuştinê re çêdike. Tîmên piştgiriyê lingê kurt li yek dawî û li goşeyek rast li hember tîmê êrîşê çêdike. Ev hem li dijî dijmin agirên alîgir (lingê dirêj) û hem jî enfilading (lingê kurt) dide. Kemîna bi teşe L-ê dikare li bendek teng a li rê, rê, an çemek were bikar anîn. Divê li cihê ku lingê kurt derbas bibe neyê bikar anîn
rê an rê rast.

Bijartina Cîh û Şeklê Kemînê (2)




Figure 7-2. Ambush formations

Çavkaniya wêneyê: US Army Training Circular 3-21.76 Ranger Handbook

Pêşniyazan ji bo kirina kemînê (1)

*Kemîn çalakiyekî leşkerî ya pir bi xeter e û divê ji aliyê kesên perwerdekirî, bi gelek plansazkirin, û bi tedbîrek tê pêkanîn.

Divê kemînê dijmin şuprîz bike. Eger şuprîz winda bibe, divê parêzvan birevin.

Komutan her şervanekî kontrol dikin da ku ekît bike ew plansazî û amadekariya kemînê fêhm dikin.

Tîmên ewlekariyê yê her du aliyên kemînê her tim berî her kesî bimeşin. Ew şervanên din biparêzin. Dema ku dijmin tê, wan agahîya hatina wan bidin komutanan. Ew ekît bikin ku ew dijminê ku wan plan kirine ye û cîh ku dijmin dikare jê xwe xilas bike bigrin da ku dijmin nikaribe bireve.

Komutan li cîhê kemînê binêrin da ku ekît bikin ku ew ya ku hatî plan kirin e. Ev jî dikare bi dron were kirin da ku koma kemînê veşartî bimîne. Nezîkî cihê kemînê nemeşe.

Pêşniyazan ji bo kirina kemînê (2)

Divê komên kemînê berbestên parastinê deynin, heta mayînan eger hebin jî, ji bo ku dijmin ji destpêkirina kemînê re nezîkî we neyê.

Komutan bîryara destpêka kemînê dide.

Divê kemîn bi sîleh/mayîn a herî mezin dest pê bike.

Dema ku parêzvanekê yekem dest bi gulebarana xwe bike, divê her kes gulebaran bike.

Komutan dikare hin parêzvanan bijêrin ku bozdin û bikevin qada kuştinê, da ku ekîta bike ku dijmin miriye û sîleh û amûrên dijminan rakin.

Divê koma kemînê plan bike ku piştî kemînê pir zû birevin. Mimkin e ku dijmin gazî takviye xwe dike. Demjimêrek bikar bînin ku hûn bizanibin çiqas dirêj dikan. Ji çend deqeyan zêdetir li wir nemînin.

Dema ku diçin, tîmek ewlehiyê li cihê xwe bihêlin. Divê ew dawî derkevin da ku parastina komê bike.

Parastina Sivîlan

Divê parêzvan alîkariya parastina sivîlan bikin. Dikare leşker û sîlehên xwe li gor cihê sivîlan bi cih bike. Parêzvan bi piranî ji dagirker bêtir dizane cihên sivîlan li ku de ne, û ji ber vê yekê çêtir cih digirin da ku wan di xetereyê de nehêlin. Dibe ku çalakiyên taktîkî yên parêzvan û stratejiya giştî bibe sedema xetera ku li hember sivîlan rû dide. Ji bo ku jê dûr bikevin:

1. Li gor hiqûqa mirovî ya navneteweyî û qanûnên mafên mirovan bimeşe.
2. Şîret ku parastina sivîlan girîng e ji hemû şervanan re îlan bike.
3. Hewl bide ku hedefên leşkerî di cihên sivîlan daneynin, û bi taybet cih ku bêtir sivîl bikar tîne wek dibistan, nexweşxane, avahiyên niştecihbûnê, û mizgeft û kenîseyan. Çênabe parêzvan xwe têxin nav sîvilan de, ji bo rêzgirtina prensîpa cudahiyê leşker û sivîlan. Tim xwedî li sivîlan derkevin.
4. Şervan divê cilê leşkerî yan nîşanên leşkerî li xwe bike.
5. Dema êrîşên dijminan tîn, divê hûn bi zemûr, medyaya civakî, SMS, bilindgo/hoparlorê hişyarî bidin sivîlan da ku dem bidine sivîlan bikin ku li stargehê/cih bi ewlê bigerin.
6. Xwarin, av, û amûrên tendirustiyê di stargehên sivîlan de deynin.
7. Her tim rê bidine karkerên mirovahî (doktor, hemşîre, minezeme, hwd.) ku xwarin, av, derman bidin û sivîlên birîndar derxînin.
8. Deverên parastî bi zelalî nîşan bidin - dibistan, nexweşxane, cihên olî, û stargeh. Bi sivîlan re tev negerin.

9. Cih ku cebilxaneyên neteqiyayî (UXO) û bermahiyên teqemenî yên şer (ERW) lê hene nîşan bikin heta ku dever bê paqijkirin.
10. Rêyên ewle yên derketina sivîlan tespît bikin.
11. Pêşkêşkirina şîretên alîkariyên ewil (ê tendirustiyê) ji bo sivîlan, û alîkariyên ewil û tourniquet bidine wan.
12. Telîmat bidin sivîlan ku bi dûrbîn an kamerayan li balkonan an li nêzî pencereyan nesekinin, ji ber ku dibe ku bi xeletî bi segvanan werin hesabandin.
13. Ekît bike ku parastina sivîlan (parastina civakî) bi têra xwe bi bataniyên agir, alavên rakirina xirbeyan, kîmyayên paqijkirina avê, çenteyên laş, nîşan ji bo tespît û tecrîdkirina deverên bi xeter, û derman ji bo sîlehên kîmyawî an biyolojîkî ne.
14. Tîmên tendirustiyê yên ku dizanin çawa birînên fîşekan, şikestina hestîyan, birînên teqînê, û şewatên mezinan derman bikin perwerde bikin û wan bikar tîne.
15. Dema ku ihtimal hebe, xizmetên bingehîn ên ku sîvîl pişt a xwe bi wan ve girêdidin vegehrînin, wek tesîsên paqijkirina avê û elektrîk.

Rêzgirtina qanûnên şer ne girêdayî daxwazê we ne. Ew ji bo sivikkirina êşa mirovan hatine çêkirin.

- Sivîlan nekin hedef.
- Rêzgirtin li prensîbên cudabûn û hevsengiyê.
- Hemû tedbîrên bigirin ji bo kêmkirin û nehîştina zirar li sivîlan.
- Sivîlan wek mertalên zindî bikar neynin.
- Destê xwe nedin êrîşên bêserûber û bêpîvan.
- Saziyên sivîl ên wekî nexweşxane û dibistan nekin hedef.
- Îşkence û îdamê nekin.
- Divê bi awayekî însanî nezîkî girtiyan û dîlên şer bibin.
- Karkerên mirovahî nekujin û nerevînin.
- Rê bide alîkariya mirovahî ji xelkê re û bihêle ku karkerên mirovahî alîkarî ji xelkê re bikin.
- Binpêkirinan lêkolîn bikin û ji hesab ji tawanbar bixwazin.

Dermankirina birîndaran

Şerê bajarî hem êrîşkar û hem parêzvanan bêtir dike. Divê parêzvan ji bo dermankirina xwe û dermankirina birîndaran amade be.

Alavên bijîşkî ji bo şer / saxbûnê

Parêzvanê Bajar amûrên ku hene bikar tîne. Doktrîna rizgariyê ya Artêşa Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê tiştên/kêta jêrîn pêşniyar dike (nivîskar hin tişt lê zêde kirine) da ku xalek destpêkek ji bo şiyarên derman şer peyda bike. Dibe ku gelek peyda nebin, lê dibe ku hin peyda bibin.

- Kêr/maqes
- Hebên paqijkirina avê (wek hebên yûdê)
- 1 şûşeyek koholê ji %2 toza yûdê
- Lûleyeke piçûk a zeliqoka pir xwîrt
- Şûşeya piçûk Betadine (povîdon û yûd di nav hev de)
- Betaniya acil
- Tayê dirianan
- lezaqa bi herdû aliyan
- Derziya dirûtinê ya qumaşê stûr
- Cilên cûrbecûr
- bandên cûrbecûr
- Doşek û betaniyên paqij
- Combat Gauze (Bendeke stewrkirî ku di nav saniyan de xwînê rawestîne)
- Torniqêt, SOFT-T serîlêdana şerker (CAT), bandê Israyîlî, an torniqêtên demikî.
- Pakêtek piçûk a dermanên cihêreng.
- Tiştên pir-armanc ku dikarin ji bo gelek karan werin bikar anîn
 - ▶ Bandana, çi qas mezin be, ew qas çêtir (kembera kompresorê, ben, bend, û paça çavan)
 - ▶ Amûrên hişk (lewîh, dar, stûn) bi dirêjahiya cûda

* Ji Weşana Teknîkî ya Artêşa Emrîkî 3-50.21 Survival ve hatî girtin

Bingehîna bijîşkî ya parastina jiyânê

Alîkariya naskirin û dermankirina birînên di rewşek şer de bi awayê herî bibandor ji bo dirêjkirina jiyânê heya ku birîndar bigihîje navada bijîjkî ya bilind tir tê bikar anîn.

- Xwînrejiya mezin (Xwînrijandin)
- Rêya hewayê
- Bêhngirtin
- Xwîngerîn
- Hîpotermiya

Rawestandina Xwînrijiya girsayî (1)

EM ÇAWA NAS BIKIN

XWINRIJIYA XURT YA KU METERSIYÊ LI SER JIYANÊ ÇÊ DIKE

XWÎNA RENG VEKIRÎ
difûre, diherike an jî
bi dûmdarî ji birî nê dirije



cilên li ser birînê
an jî bendkirina bê bandor
TÊN AVDAN BI XWÎNÊ



GIRING! qurbaniyên bi birînên giran eger xwîna wan birije dibe ku bimrin di 3 deqan de



XWÎNA RENG VEKIRÎ
li erdê kom dibe

JÊKIRINA
dest an jî ling

Sê tişt di çenteya isafa detpêkê dibe ku bê bi kar anîn ji bo

KONTROLKIRINA XWÎNRIJIYA MEZIN



TORNÎKÊT



BANDÊN RAWESTANDINA XWÎNÊ



BANDÊN ZEXTÊ



TORNÎKÊT xwînrija ji dest an jî ling radiwestîne ji paş cihê girêdanê, ev baştrîn rêbaz ji bo kontrolkirina xwînrija girseyî ye.

Tornîkêt bicîh bikin
û di nav 1 deqe de
xwîne rawestînin



KENGÊ Û ÇAWA TORNÎKÊT BI KAR BÎNIN
KURT NIVÎSA TORNÎKÊTÊ (TQ):

di bin agir/gefan de bi lez û bez
tê bi kar anîn: bilind û teng
li ser milê / lingê birîndar an
dema ku çavkaniya xwîne ne diyar e.

lênêrîna zewiyê taktîkî (TQ)
bi zanebûn 5-7 cm
li jorê birînê tê girêdan.

Ger xwîn bi yek TQ-ya ku bi rêkûpêk
hatî girêdan neyê rawestandî
TQ-ya duyemîn bicîh bînin
(Têbînî: birînek xwînrijiya giran a
di rehn de pir caran TQ-
ya duyemîn hewce dike.)

Rawestandina Xwînrijiya girsayî (2)

BI KAR ANÎNA ZEXTA RASTERAST Û DAGIRTINA BIRÎNÊ



Birînê DAGIRE BI BANDA
HÎMOSTATIK ya ku madeyeke
têde heye ku tasiona xwînê
pêşve dibe, Eger ku ev band peyda
nebe, qumaşeke paqij bikar bînin.



Bi kêmanî 3 deqan an heya
ku xwîn raweste,
ZEXTEK HIŞK,
RASTERAST BIKIN

BANDÊ HIŞK li dora milê/lingê birîndar BIPÊÇIN,




Bi karanîna kişandina kurt bi rengê yeksan
li dora mil/lingê bicîh bikin û di heman demê de
tansiyona domdar li ser bandê biparêzin
da ku zext were domandin.

Wêne
û

krediya naverokê: <https://deployedmedicine.com/market/171/content/848>

Pêwiste ku rêça hewayê vekirî be / bimîne

Misoger bike **KU RIYA HEWAYÊ NE GIRTIYE**



⚠ GIRING! Çi tiştên ku xuya dibin rakin, lê tiliya xwe bi rengekî çav girtî bi kar neynin.

Nîşan û berateyên dibe ku rêça hewayê hatibe girtin:

- Birîndar di tengasiyê de ye û nîşan dide ku ew nikarin bi rêkûpêk nefesê bigirin.
- Kesê birîndar dengê qîrîn an qurqurê derdixe.
- Di rêka hewayê de xwîn an tiştên biyanî yên xuyayî hene.
- Travmaya giran li ser rûyê kesê birîndar

Di qurbaniyek bêyî astengiyek hewayê de, hûn dikarin manevrayên jêrîn pêk bînin



Wêne û krediya naverokê: <https://deployedmedicine.com/market/171/content/848>

Pêwiste ku rêça hewayê vekirî be / bimîne

**alîkariya birîndarên hişmend bikin
û ji wan re bibin alîkar
ku her rûniştina
rehet bigirin ta ku
BIHÊLE EW BI HÊSANÎ
NEFESÊ BIGIRIN**



**Ji bo birîndarek bêhiş
ku ne di şokê de ye,
wan bixin nav
REWŞA BAŞBÛNÊ**




Wêne û krediya naverokê: <https://deployedmedicine.com/market/171/content/848>

Bêhngirtin

Nîşaneyên tengahiyê bêhnê dibe ku:

- Zehmetiya bêhnê
- Têkoşîna ji bo kişandina hewayê li hundir û derve
- Bêhn kişandina pir lawaz ku bi bandor be (kêmtir ji 6 bêhndan di deqakê de)
- Bêhndana bilez (zêdetirî 20 bêhndan di deqakê de)
- Tiştên li jor dibe ku birîna sîngê nîşan bidin.



BIRÎNÊN LI SÎNGÊ AN JÎ DI ZIK DE DANEGIRE!

Sîngê bi cilê plastîk ji
bandê veqetînin û bigre.

Wêne û krediya naverokê: <https://deployedmedicine.com/market/171/content/848>

Xwîngerî

Ji bo pêşîgirtina şokê qavan bavêjin

- Ji nû ve binirxînin hemî tedbîrên kontrolkirina xwînê hîn bi bandor in.
- Piştrast bike ku hemu torniqêt hê jî teng in.
- Heger mirov ji birîndar û birînên wan re tehemûl bike, lingên wan bilind bikin.

Nîşan û berateyên şokê ev in:

- Bêhdana bilez
- Wendakirina balê an jî zehmetiya tevlêbûnê
- Çermê ter, hênik, gemaî
- Çermê zer an gewr

Hîpotermiya

Hîpotermiya; dakitina germahiya laş dibe ku bibe metirsî, ku bi gelemperî ji ber dirêjkirina germahiya sar dibe sedema. Pêdivî ye ku ew ji ber windabûna xwînê ya girseyî ne ji hewayaya sar were şopandin, pêşgirtin an jî were çareser kirin.

Nîşan û berateyên hîpotermiyê:

- Axaftina şêlû an jî matmayî
- Dilerizîn
- Bêhinkişana hêdî û çavên li xew

Bi kirinên jêrîn re bibin alîkar ku pêşî li hîpotermiya bigirin:

- Heya ku cil û berg pir şil nebe, li ser kesê birîndar bihêlin, paşê jê bikin
- Birîndar ji erdê rakin
- Kesê birîndar bi betanî, çarşef an jî maddeyên ku dê germê bihêle veşêrin.

Wêne û krediya naverokê: <https://deployedmedicine.com/market/171/content/848>

Bi Ewlehî û Lênêrîna Bêhtir Li Birîndar Binerin

Pêdivî ye ku parêzvan amade bin ku birîndarên xwe bigihînin ewlehî û lênihêrîne. Divê ew gelek zibilên xwemalî çêkin (alava hilgirtina 2 kesan). Tiştê ku hewce ye stûn e (dar / hesin / plastîk) û materyalek (betanîn, çakêt, hesîr), mîna:

Afrandina dartermekê bi karanîna betanî û stûnan

Ji bo ku dartermekê bi betanî û stûnan çêbike, divê gavên jêrîn werin bikar anîn:


- Betaniyê vekin û stûnekê bi dirêjahî di nava wê de deynin, paşê betaniyê li ser stûnê bipêçin.
- Stûna duyemîn li nava betaniya pêçandî deynin.
- Kavên azad ên betaniyê bipêçin



li ser stûna duyemîn û li ser pola yekem.


Afrandina dartermekê bi karanîna qutik, çakêt, û stûnan

Ji bo ku dartermekê bi qutik an çakêtan çêbike, qutik an çakêtê bişkojk an zincîr bike û bizivirîne hundur, milên xwe li hundur bihêle, dûv re herdu stûnan di nav milan re derbas bike.



Avê vexwe!

Divê parêzvanê bajêr avê vexwe. Hûn dikarin tenê çend rojan bê av bijîn. Av jiyan e. Nîşanên kêmbûna avê ev in: westîn, serêş, çermê hişk, kêmbûna xwêdanê, êşa qas û zik, kêmbûna mîzê, çûna serhişê û epîlepsî. Nîşanan bizane. Tu dikarî ava vexwarinê paqij bike. Berf û baran kom bike û bihelîne. Av ku tu bibîne bikelîne. 2 dîlopên klor (ya bê bîhn) an 5-10 dîlopên yûd têxe her lîtrek av. Dema tu gumanê paqijiya avê xwe bike, paqij bike. Vexwarina ava qirêj dibe sedema verşîn, îshal, û mirinê.



Rêbernameya dozên klor ên 5% klorê male (bêbîhn) û 70% hypochlorit					
Ji bo 19 lîter av	Doza klor bi 5% klorê malê (bê bîhn)				
	1 mg/L	2 mg/L	5 mg/L	10mg/L	100 mg/L
	6 dilop	.75mL	1.9mL	3.8mL	39.4 mL
	Doza klor bi 70% hypochlorit				
	1 mg/L	2 mg/L	5 mg/L	10mg/L	100 mg/L
	0.9mL	1.7mL	4.1mL	8.3mL	

Baran û Berf

Baran - Ava baranê ya taze ya ku di bîdonan de tê berhev kirin hewcedarî paqijkirinê nake. Lêbelê, dibe barana ku avahî, pel û nebat derbas dibe, qirêj bibe û divê were paqij kirin. Ava baranê di bîdonan de rasterast ji ezmanan kom bikin.

Berf - Berfa teze û paqij wekî çavkaniyek avê bikar bînin. Bîdonên bi berfê dagirtî li nêzî agir an di navbera kincan de bihêlin da ku germahiya laş ew bihêlîne. Zêdekirina avê li berfê dê bibe alîkar ku ew zûtir bihele. Berf rasterast nexwin, ew laşê te sar bike.


Divê destê xwe, xwarinê xwe, û avê xwe paqij bin

Nexweşî dikare ji guleyên dijmin bêtir parêzvanên bajaran bikuje. Di demên berê de, nexweşî û birînên ne girêdayî şer sedema ji sedî 80ê mirinan. Niha leşker paqijîya hişk pêk tînin.

Berî xwarinê divê hûn destên xwe bişon. Alkol an sabûna antîbakterî bikar bînin.

Serşok û tuwalet ji xwarinên xwe dûr bin (100 metre yan jî zêdetir). Tuwaletan ji bîr, çem û çavkaniyên din ên avê 30 metre an zêdetir dûr bixin.

Nehêlin mêş bikevin xwarina we.



Danustandin bi girtiyên şer ên dijmin re

Dibe ku girtiyên dijmin bikevin destê parêzvanê bajarî. Her tim bi girtiyan re bi awayekî însanî tevbigerin.

- **Kontrol** - Li girtiyan li sîleh û cebilxane, agahiyên îstîxbaratê, û tiştên qedexe bigere û ji wan bistîne.
- **Bêdengî** - Nehêle girtiyan bihevre biaxivin û nehêle kes bi wan re biaxive. Tenê ji bo danîna emir û ferman bi girtiyan re biaxive.
- **Cudakirin** - Girtiyan li gorî rêz, zayend, netew û rewş ji hev cuda bikin.
- **Parastin** - Li gor Peymanên Cenevreyê girtiyan ji zîrarê biparêze, tev xeterên şer jî. Dermana birîndaran wan bike.
- **Zû bibin paş** - Girtiyan ji qada şer derxînin û bi lez û bez wan vegere cîheke paşîn ku revêberî dikarin wan rahêjin.

Bombeyên neteqiyayî (UXO)

Di şerê bajaran de gelek bombe, hawan, top, û sarox ên ku neteqin hebin. Dijmin jî mayin, xefikên bombebarkirî û tiştên din li dû xwe bihêle.

Hemû bombeyên neteqiyayî wekî zindî hesab bike. Pir bi xeter in. Li gor wan peşnîyaran li jêr bimeşin:

Nas bike - Ku ew li wir in. Ew bi xeter in, bi taybet ji bo zarok û kesên din ên ku nêzîk bibin.

Derkeve - Dest nedin, ranekin, û nêzik nebin.

Xaber bid - ji tîmên paqijî re

Îradeya Têkoşînê

Divê parêzvanên bajaran îradeya şer bixin dilên xwe.

Divê hêviya serkeftin bi wan re hebin. Di warê bajarî de fêde wan hene.

Leşker ji bo dîktatoran şer nakin. Dema ku bi zorê an jî tenê ji bo pere tevî bibin, şer nakin.

Leşker ji bo miletê xwe, ji bo azadiyê, ji bo malbatên xwe û ji bo hevdû şer dikin.

Nahêlin tirs bi ser keve. Hemû leşker tirs tam dikin. Di komên biçûk de bi hev re şer bikin û bimînin. Hevaltî yê ku di koma we de çêdibin, di şer de bibin mertal li hemberî tirsê.

Parêzvanê bajarî dixwaze tirs bixe dilê dagirkeran de, tirs ku îradeya dijmin û dagirkeran bikuje.